

## Tola Îsikê li difna Mûsikê vedike

Di van hefteyên dawî de, rejîma Îranê dest bi girtinên berfireh kiriye, bi hincet û tohmeta sîxorî bo Îsraîlê. Li gor raporên fermî û çavdêrên mafên mirov, zêdetir ji 700 kes bi tohmeta hevkarî an sîxorî bo Îsraîl hatine girtin, lê hin çavkaniyên serbixwe ......

Dom»R:9






## Komara Îslamî û Îsraîl: Şerekî bêveger

Komara Îslamî ya Îranê û Îsraîl bi salan di şerekî veşartî û bi wekalet de bûn. Lê tiştê ku di Xakelêweya 1403 de qewimî nîşana dawiya vê serdemê û destpêka şerekî rasterast û bêveger bû. Di 25ê Xakelêweyê de, bo cara yekem, Spaha pastaran a terorîstî a Îranê rasterast bi êrîşeke mûşekî axa Îsraîlê kire armanc, êrîşek ku ji bo tolhildana kuştina fermandarên Îranî li Lubnan û Filistînê hat kirin. Ji wê gavê û pê ve, her tişt guherî.

Dom» R:10

*Bidesîveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (497)06-07-2025Buha (1000) Tûmen*



## Siyasetên şaş yên dewletên Norwêjê, piştgirê rejîma Îranê bûye

Di Nîsana 1997an de, dadgeheke Almanî gihîşte wê encamê ku rejîma Îranê li pişt kuştinên siyasî ya rêberên kurd li Berlînê ye. Li ser wê encamê delîl û belgeyên bê şik û guman hebûn: Îstîxbarata Îranê li ser axa Ewropayê kuştin pêk anîbûn. Berteka hember wê kiryara hovane dîrokî bû. Welatên Ewropî balyozên xwe ji Tehranê vekişandin. Norwêjê jî bi salan pêştir balyozê xwe ji Îranê vekişandibû.

Dom» R:5

# Daxûyaniya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bo mehkûmkirina pêla nû a êidaman bi tohmeta hebûna pêywendî digel Îsraîl




Dezgeha dadweriya rêjîma komara Îslamiya Îranê ragihand ku sibêdeha roja Çwarşemiyê 4ê Pûşperê, 3 girtiyên Kurd li girtîgeha Urmiyê de bi tohmeta sîxurî bo Îsraîl, hetne sêdaredanê.w
Li sêdaredana Îdrîs Alî, Azad Şucaî û Resûl Ehmed Resûl di demekê de ye ku li 2 hefteyên derbasbûyî de gorî zaniyariyan 3 kesên dinê jî her bi tohmeta sîxurî bo Îsraîl ji aliyê rêjîma Îranê ve hatine bidarvekirin û ev mijar bûye cihê tirs û nîgeraniya micid bi ser xelkê Îranê û destpêka zincîre kuştar û sêdaredana xelkê bê sûç û bi tohmetên bê bingehe hebûna pêywendî digel Îsraîlê de.

Hevdem digel sêdaredana wan 6 kesan li heyamê 2 hefteyên derbasbûyî de, sedan kesên dinê jî li bajar û navçên cuda cudaye Îranê ji aliyê navendên ewlehiyê yên rêjîmê ve hatine girtin û tohmeta hebûna pêywendî digel Îsraîl xistine ustiyê wan.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê tewî şermezarkirina wê kiryara dijîmirovane a navendên ewlehî û dezgeha dadweriya rêjîma Îranê, em raya giştî a cîhanê û navendên parêzerên mafê mirov agehdar dikin ku rêjîma komara îslamî li wê rewşa niha de bo çavtirsandina xelkê Îranê pêlek ji girtin û bidarvekirinê dest pêkiriye û hevdem cehdê dike ku tola şikestên xwe ji xelkê û girtiyên siyasî weket.

Hizba Dêmokrat tevî haydarkirinê li derheq egera wan cinayetan, daxwazê ji hemî rêkxistinên siyasî û navendên parêzvane mafê mirov dike ku ji bona agehdarkirina raya giştiye welatan û pêşîgirtin ji karesatekî wiha, tev cehda xwe bêxne ger.

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**

**Desteya Kargêrî**

**25ê Hezîrana 2025 a Zayînî**



## Biçûk bûna jeopolîtîka Îranê û hewcehiya yekgirtina Netewî

Dom » R:4



## Sûriye di navbera Îbrahîmî û Osmanîzmê de

Dom » R:8

# Dr. Qasimlo, vexwendineke nû ji rêberiya Exlaqmedar di Dîroka Siyasî ya Rojhilata Navîn de



**N. Serbet Urmiye**

Dr. Ebdulrehman Qasimlo (1930–1989) yek ji rêberên siyasî yên herî navdar ên Rojhilata Navîn di sedsala 20’an de ye ku karî têgehên bi hev re nakok wate desthilatdarî û xizmetkariya gel, berxwedan û aştî, nasname û cîhan nîştimaniyê di pergaleke “teorîk-pratîk” a hevgirtî de bîne cem hev.

Ew Sekreterê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê û rewşenbîrek sosyal-demokrat bû ku berevajî rewşa siyasî ya serdest a vê demê li herêmê de, tekez li ser ji hev têgihîştinê, gotûbêj, wekhevî û hebûna exlaq di desthilatê de dikir.

Di serdemekê de ku siyaseta herêmî di çembereya tundûtûjî, totalîtarîzm û îdeolojiyên totalîter de hatibû dorpeç kirin, Dr. Qasimlo ji neteweyên herêmê re û bi taybetî ji bo neteweya Kurd asoyeke din vekir: asoyek li ser bingeha mirovhezî, demokrasiyê û çareseriya aştîxwazane ya arîşeyan.

Ji bo ku me vexwendineke nû ji Dr. Qasimlo weke rêberekê exlaqmedar di siyasetê de, kiribe dibe ku em wî reberê mezin di aliyên cuda yên hizrî de pênase bikin, Ku di wir de her çend bi kurtî jî be, hewil hatiye den.

**Dr. Qasimlo û pêgeha siyastê; Siyaset di siya eqlaniyet û exlaq de**

Dr. Qasimlo, di bin bandora kevneşopiya sosyal demokrat a Ewropayî de û ezmûna xwe weke Kurdekê, di hersê biyavên gotûbj, berpirsiyarî û aqilmendiyê de, pêgeha siyasetê ji nû ve pênase kir.

Wî ji siyaset ne wekî qadekê ji bo jiholêrakirina hevrikan, belkû bi meydanekê ji bo bi hev re jiyan û pejirandina taybetmendiyên ji hev cuda mêze dikir. Di gotara xwe de, rêberî bi wateya “berpirsiyariya exlaqî” bû û desthilat tenê demekê wateya rast dide kû di xizmet wekhevî, parastin û jordebirina kerameta mirovan de be.

**Aştiya hertimî; Ji girêbesta siyasî ve bo Pêvajoya Şaristaniyê**

Di hizra Dr. Qasimlo de, aştî ne bi wateya dawiya şer, belkû destpêka ji nû ve avakirina civak û siyasetê bû. Di ramanên wî de ew sê pêkhateyên bingehîn pêdiviyên aştiya hertimî û domdar bûn:

**1.** Diyaloga rastîn û berdewam, ne danûstandinên rûyekî;
**2.** Dadperwetiya aborî, siyasî, civakî û çandî ji bo hemû welatiyan;
**3.** Demokrasiyê û qebûlkirina cudahiyên zimanî û neteweyî.

Dr. Qasimlo yek ji wan rêberên herêmî bû ku aşitiyê ne di pêgeha bêhêziyê de, belkû weke rûmet û pêgihîştina siyasî û hêza exlaqî dişopand.

**Nasname û Cîhanîbûn: Siyaset li Cîhana Postkolonyal de**

Wekî rewşenbîrekî Kurd, Dr.Qasimlo hêla dijberiya ne serrast a di navbera “nasnameya neteweyî” û cîhan nîştimaniyê tevlîhev da.
Di baweriya wî de mirov dikare hevdem Kurd be, ji zimanê xwe yê dayikê hez bike û perwerde bibe û di heman demê de jî ji bo demokrasiyê, mafên mirovan û dadperweriya cîhanî şer bike.
Di vê çarçoveyê de, wî modelek nû ya siyasetê li cîhana postkolonyal pêşkêş kir: modelek ku tê de hemû netewe dikarin derveyî bazneya şovenîzmê, roleke çalak di civaka navneteweyî de hebin.

**Stratejiya Guhertinê: Ji Şoreşa Tundajo ve ber bi Reforma Demokratîk**

Berevajî piraniya rêberên siyasî yên li Îranê dideh salên salên 60 û 70’an ên Rojî de, ku guhertin tenê bi rêya serhildanên tundûtûj de pênase dikirin, Dr. Qasimlo tekez li ser guhertina gav bi gav, hişmend û xwedî rêkxistin dikir.
Têgihîştina Dr. Qasimlo ji tundûtûjiyê, berdewamiya bêdawî ya tolhildan û tepeserkirinê bû, lewma di şûna hilweşandina sîstemê bi milê zorê de, wî bawerî bi reformên bingehî



di sîstemê de û di rêya beşdariya medenî(sivîl), diyalog û yekîtiya hêzên demokratîk hebû.

**Exlaq li hember Desthilatê; Dr. Qasimlo li dijî Makyavelîzma Rojhilata Navîn**

Di ramana Dr. Qasimlo de, exlaq ne bedewî û xemila peyvan bû, belkû pêvanek bû ji bo nirxandin û hilsengandina desthilatê. Wî ji rêberê siyasî weke berpirsiyarê yekem yê exlaq di civakê de mêze dikir.
Di rewşek de ku gelek ji tevgerên hevçerx exlaq gorî berjewendiyên demkurt ên desthilatdariyê kirin, Dr. Qasimlo bi terzeke micid li ser vê prensîbê sekinî ku: “berdewambûna her tevgerekê ne di pir çekbûna vê de ye, berevajî di rastiya armancên vê de ye.”
Lewma, Dr. Qasimlo di kêleka kesayetiyên wekî Mandela, Howell, û Martin Luther King, de weke rêberekên tê nasandin ku hem siyasetmedar û hem jî mirovhez bû.
Rêberê ku li şûna siyasî kirina exlaq de, siyaset exlaqmend.

**nûjenkirina teorîk; ji nû ve Formulekirina Pirsa Neteweyî û Demokrasiyê**

Dr. Qasimlo di warê teorîk de jî rebereke nûjen bû.
Însiyatîfên wî yên herî girîng ên rewşenbîriyê dikarin wiha werin kurtkirin:
• bi hev re girêdana pirsên neteweyî û demokrasiya civakî: Wî nîşan da ku pirsa Kurd ne tenê pirsek neteweyî ye, pirsek e ku girêdayî desthilata totalîter a navendî ye û tenê di çarçoveya pergaleke federal, demokratîk û sekolar de çareser dibe.
• exlaqmendiya siyasetê : Siyaset divêt ku xizmeta parastin û jorde birina keramet mirovan bike, ne alavek be ji bo parastin û sepandina desthilatê.
• gotûbêj çavkaniya guhertinan: Berevajî hizra zordarî û serdestiyê, Dr. Qasimlo ji danûsitandinê weke xala sereke ya kemilîna siyasî mêze dikir.
• tesbît kirina pêhega erênî ya Kurdan di Îrana pêşerojê de: Kurd ne gef in, belkû hevalbendên di demokrasiyê ne.
• pêk ve girêdana nasname, wekhevî û sekularîzmê: Sê bingehên modern yên pêkhateya rewşenbîriyê di siyaseta herêmî de .

**Encam:**

Terorkirina Dr. v Qasimlo, bi tenê ji holêrakirina kesayetiyeke navdar ê siyasî nebû; bêdengkirina yek ji dengên bê wêne di warê, diyalog û aştîxwaziyê di dîroka hemdem a Rojhilata Navîn de bû.
Bikujan derbeyek li pêvajoyeke rastîn ji bo cihgîrkirna aştî û demokratiyê di Kurdistan, Îran û herêmê de dan.

Lê Dr. Qasimlo bi dawî nehatiye; hizir û ramanên wî hertim di xebat û tekoşîna rêvîngên rêbaza wî de, rêberiya pêvajoya aştîxwaz a neteweyî-demokratîk ji bo Kurdistan û heremê dikin.
Lewma ye ku dibêjin Dr. Qasimlo di rêbaza xwe de zindî ye.

# Şiroveya hundirnasiya kesayetî ya “Dr. Qasimlo” bi tekezkirina bi ser teoriyên kesatî û rêberiyê



N. Bêhzad Qadirî
W. Bêhzad Simko




**Pêşgot**

Rêberê Şehîd “Dr. Qasimlo”, kesayetiyek xuya yê siyasî, hizrî û rewşenbîriya Kurdistanê li sedsala bîstem de bû ku hizira wî bû mektebek mezin li Rojhilatê Kurdistanê û niha jî bi sedan hezar kes li vê mektebê de bi şêwazên curbicur, xebat û tekoşînê dikin.

“Dr. Qasimlo” wek Sekreterê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdiustana Îranê, rolek girîng li siyaseta aşîtîxwazane û dîplomasiyê bo gihîştin bi mafên Kurd ên li Rojhilatê Kurdistanê hebûye û terorkirina wî li “Viyen”ê li sala 1989 a Zayînî de dawî bi hizr û bîra wî û tekoşîna rêvîngê vî neanî.

Kesayetiya “Dr. Qasimlo”, ne bi tenê li warê siyasî, belkû li warê hundirnasiyê ve jî girîng e û dibe ku lêkolîn li ser bêne kirin, çimkî wî, modêlek ji serkirdayetiya têkel a “karîzma, aqilmendî, xwedî exlaq û diyalog”ê pêşkêş kir.

Em li vê gotarê de hewlê didin ku bi kurtî û bi bikaranaîna teoriyên hundirnasiyên kesayetî û rêberatiyê(wek teoriya pênc fakteriya kesayetî, teoriya rêberiya guherînxwaz û teoriya bizivîna sehan), bas ji aliyên kesayetî û şêwaza rêberatiya “Dr. Qasimlo” bikin.

**Jiyan û çalakiyên “Dr. Qasimlo”**

“Dr. Ebdulrehman qasimlo” li sala 1309 a Rojî de li gundekî ser bi bajarê Urmiyê de ji dayîk bû; li sala 1341 a rojî de li zanîngeha Pragê de birwanameya Duktora li zanista aborî de vergirt û heta sala 1349 li vê zanîngehê de waneyên “aboriya sermaye û aboriya sosyalîstî û hizra geşeya aborî” digotin.

“Dr. Qasimlo” şarezayiyek tevav bi ser zimanên “Kurdî, Farsî, Tirkî, Erebî, Firensî, Ingilîsî, Çêkî û Rûsî” de hebû û heta astekê jî zimanên “Almanî û Islawî” jî dizanî.

“Dr. Qasimlo” heyama 18 salan wek rêberek xwedî bandor û jêhatî, rêberatiya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê kir. Wî li ser “danûstandin, dêmokrasî û rêçareya aşitîxwazane” li hember dewleta Îranê tekezî dikir û her liser mase ya danûstandinê digel nûnerên dewlata Îranê bû ku hate terorkirin.

**Çarçoveya teorîkî û gotar**

- ev teoriya, kesayetiyê bi ser 5 xalên bingehîn parvedibe, anku “Big Five” bi ser 5 fakterên kesayetî “dervexwazî, rizamendînîşandan, erknasî, cihgîriya sehan û vekirîbûn li hember ceribandinan” de par ve dike.
- Teoriya serkirdatiya guherînxwaz; Ev teoriya bi ser 4 taybetmendiyên rêberên guherînxwaz tekezî dike ku ji “Karîzma û bandor û karlêkeriya îdealîstî, bizvênerê rênîşander, handana hizrî û berçavgirtina kesîn” pêk tê.
- Hişmendiya Sehan; Hişmendiya sehan, rolek giring li biryardan, birêvebirina givaş û pêwendiyên mirovî ve heye. Ku ji “hişmendî, xwekontrolkirin, bizvêner û hander, hevxemî û jêhatîbûna civakî” pêk tê.

**Taybetmendiyên kesayetiya “Dr. Qasimlo” li ser binyata modêla 5 fakterî**

- Dervexwazî: “Dr. Qasimlo”, kesayteiyek civakî, morelder û rûrast hebû. Beşdarîkirin li kombûnên navnetewî û pêwendî û hevdîtinên digel ragihandinan, rojnameyan û radyoyan, belgeyên vê taybetmendiya “Dr. Qasimlo” ne.
- Rizayetînîşandan: “Dr. Qasimlo”, baweriyek kûr bi diyalog û lihevkirinê hebû. Heta dema ku li hember dujmin de jî disekinî, berdewam tekez li ser çareseriya dîplomatîk dikir.
- Erknasî: dariştina bernameyên hûr, dîsîplîna siyasî û lipeyketinên armancdar ên “Dr. Qasimlo” bo daxwaziyên gelê Kurd, belgeyên rohn ên kesayetiya “Dr. Qasimlo” ne.
- Cihgîrbûna Sehan: Şiyana “Dr. Qasimlo” li kontrolkiirna sehan, heta li rewşên metirsîdar,(wek danûstandinên nihênî û gefên kuştinê), cihê balkêşandinê ne.
- Vekirîbûn li hember Ceribandinan: “Dr. Qasimlo”, bi sedema vê ku li welatên cuda de jiya bû û xwendina akademîk hebû, xwedî hizrek vekirî û rohnkar bû. Hizrên vî têkeliyek ji hizrên resen(bi berçavgirtina civaka Kurdistanê) û modern(bi berçavgirtina civaka rojavayî) hebû.

**Şêwaza rêberatiya “Dr. Qasimlo”, wek rêberek guherînxwaz**

- Karîzma: gotarên karlêker, şiyana handan û hêz û morel bi xebatkaran û wêneya erêniya giştî ji “Dr. Qasimlo”, karîzmaya bilind a wî didin xuya; Herwisa vejandin û rakirneserpêya Hizba Dêmokrat, belgeyên kesayetiya karîzmabûna “Dr. Qasimlo” ne.
- Bizvênerê Rênîşander: “Dr. Qasimlo”, xwedî îdealên rast bû û bo paşerojek baştir, hivî bi civaka Kurdistanê dida. Gotar û nivîsên “Dr. Qasimlo” li ser “Sosyalîzma Demokratîk” rastiyên vê yekê diselimînin.
- Handana hizrî: Xwdîhizir û danûstandinkar bû. Şirove û rohnkirinên aborî-siyasiyên wî hêj niha jî cihê bawer in û dibe bêne cîbicîkirin.
- Berçavgirtina kesîn: Hevkar û hevxet û kesên nêzîkî “Dr. Qasimlo”, wî bi kesek dilsoz û xemxwer binav dikin.

Kontrolkirina sehan a “Dr. Qasimlo”

- Hişmendî: “Dr. Qasimlo”, têgihîştinek kûr û hûr ji şiyanan, sînordariyan û jîngeha siyasî û civakî hebû.
- Xemxwerî: “Dr. Qasimlo” li gotûbêjên xwe heta digel dujminan de jî nek tenê awirek îdeolojîk nebû belku dîtingehek mirovî hebû.
- Xwekontrolkirin: Tevî hemû gefên berdewam bi ser “Dr. Qasimlo”, wî hevsengiya reftara xwe diparast.
- Jêhatîbûna civakî: Şiyan li pêkanîna hevpeymaniyên siyasî û rakşana piştevaniya navnetewî(bi taybet dostatiya nêzîk digel Firansê), jîhatîbûna bilind a civakiya “Dr. Qasimlo” didin xuya.

**encam**

“Dr. Qasimlo li rêzbendiya serkirdeyên wek “Nelson Mandela” û “Tomas Garrigue Masaryk” ê Çêkulsovakiya berê” de ye ku bi têkelkirina “Hizir, miyanneroyî û pragmatîzmê”, çareseriyên aşîtîxwazane û hevrikiyên netewî û siyasî pêşniyar kir.

Kesayetiya “Dr. Ebdulerhamn Qasimlo” dibe ku wek mînaka herî bilind a rêberatiya guherînxwaz bê dîtin. Navberî bi mifahvergirtin ji taybetmendiyên hindirnasî yên erênî yên wek “cihgîrbûna sehan, kontrolkirina bilind a sehan û vekirîbûn li hember ceribandinan”, karî modêleke mirovî û exlaqî li hundirê tevgerek siyasî de bîne berçavan.

Rohnkariya hundirî bo kesayetiya “Dr. Qasimlo” ne tenê her bo têgihîştina baştir a dîroka Kurdistanê alêkarder bû, belku bo hundirnasiya rêberatî li cîhana serdem de jî cihê jêhînbûnê ye.

# Biçûk bûna jeopolîtîka Îranê û hewcehiya yekgirtina Netewî



N. Dr . Mecîd Heqî

Ji Hezîrana 2025an vir ve, Rojhilata Navîn şahidiya veguherînek jeopolîtîk a bêhempa kiriye ku nexşeya hêzên herêmî û têkiliyên hêzên ne-dewletî bi awayekî berbiçav guhertiye. Komara Îslamî ya Îranê, ku bi dehsalan xwe wekî lîstikvanek sereke di "eksena berxwedanê" de û piştgirek stratejîk a tevgerên milîsan li Lubnan, Sûriye, Filistîn û Yemenê nîşan da, niha di encama rêze têkçûnên stratejîk de bûye welatek îzolekirî, lawaz û parastî.

Di vê navberê de, neteweya Kurd û partiyên Kurdî li rojhilatê Kurdistanê (Îran) bi rewşek nû re rû bi rû ne: rewşek ku tê de qelsiya navendê û hilweşîna xetên bandora herêmî yên Komara Îslamî derfetek dîrokî ji bo hevgirtin, rêxistin û avakirina stratejiyek nû peyda kiriye. Lêbelê, sûdwergirtina ji van mercan tenê bi rêya hevpeymaniyek bi bandor û prensîbî di navbera partiyên Kurdî de mimkun e; hevpeymaniyek ku ji marjînalîzekirina siyasî ber bi rolek dîrokî ve diçe.

Tevliheviya dawî ya Rojhilata Navîn di 7ê Cotmeha 2023an de dest pê kir, dema ku koma terorîst a Hamasê êrîşek ji nişka ve û kujer li ser Îsraîlê da destpêkirin. Ev kiryar, ku bi piştgiriya îstîxbarat û lojîstîkî ya Îranê hat kirin, bû sedem ku Îsraîl bersiveke leşkerî ya mezin bide destpêkirin ku di demek kurt de ji Xezeyê jî derbas bû. Di qonaxa din de, çeperên Hizbullahê li Lubnanê û hêzên girêdayî Îranê li Sûriyeyê bi giranî hatin hedefgirtin.

Nekarîna Hizbullahê ya rûbirûbûna artêşa Îsraîlê û kuştina bi dehan fermandar û efserên îstîxbaratê yên wê bi bandor baskê leşkerî yê Komara Îslamî li Lubnanê felç kir. Di vê navberê de, rejîma Beşar Esed di 8ê Kanûna Pêşîn a 2024an de hat hilweşandin. Bi hilweşîna Şamê û hatina hêzên opozîsyonê yên nêzîkî Tirkiye û Erebistana Siûdî ser desthilatdariyê, Tehran yek ji hevalbendên xwe yên herî girîng ên herêmî û xeta xwe ya ragihandinê ya bejayî bi Derya Spî re winda kir.

**Şerê 12 rojî yê di navbera Îran û Îsraîlê de, ku di 13ê Hezîrana 2025an de dest pê kir, xalek werçerxê bû di pêşkeftinên stratejîk ên herêmê de û destpêka kêmbûna eşkere ya hêza jeopolîtîk a Komara Îslamî.**

Şer piştî têkçûna danûstandinên dawî yên di navbera Tehran û Washingtonê de li ser bernameya nukleerî ya Îranê û pejirandina biryarek tund ji hêla Lijneya Rêvebiran a Ajansa Enerjiya Atomî ya Navneteweyî ve dest pê kir. Îsraîl bawer dikir ku Îran tenê çend hefte dûrî bidestxistina çeka navokî ye, û ji ber vê sedemê, operasyoneke leşkerî ya pêşîlêgir bi armanca tunekirina şiyanên navokî û mûşekî yên Tehranê hate plankirin û pêk anîn.

Şer bi operasyonên hewayî, mûşekî û sîber ên Îsraîlê yên hevrêzkirî, bê mînak bû. Êrîşan tesîsên nukleerî yên Îranê li Natanz, Fordow û Îsfahanê; baregehên mûşekî li Hemedan, Tebrîz û Kirmaşanê; û navendên fermandariya IRGC li Tehran, Kerec û Qumê hedef girtin.

Herî kêm 30 fermandarên payebilind ên IRGC û Hêza Qudsê, di nav de kesayetên girîng ên di avahiya parastinê ya Îranê de, û zêdetirî 14 zanyarên nukleerî hatin kuştin. Parastina Îranê nekarî li hember êrîşên mezin bisekine, û Îsraîlê bi eşkerekirina penetrasyona xwe ya kûr a îstîxbaratê di avahiya leşkerî ya Îranê de, rewatiya ewlehiyê ya rejîmê xist ber pirsê.

Bi agirbestek nazik a ku ji hêla Donald Trump û Qeterê ve di 24ê Hezîranê de hat kirin, Îran bi wêrankirina binesaziya xwe, qelsbûna hêza xwe ya leşkerî û şikestina moralê xwe ket qonaxek nû ya tecrîdê. Vê şerî ne tenê pozîsyona herêmî ya Komara Îslamî wêran kir, lê di heman demê de krîzek navxweyî di IRGC, pergala rêveberiyê û bingeha wê ya civakî de jî çêkir. Hilweşîna stratejîk a Îranê li ser asta herêmî û qelsiya avahiya ewlehiyê ya di hundirê welêt de bê guman valahiyek jeopolîtîk afirandiye ku ne tenê ji bo hêzên biyanî, lê di heman demê de ji bo hêzên neteweyî û gelêrî jî derfetek e.



Di van şert û mercan de, neteweya Kurd li rojhilatê Kurdistanê bi rewşek bêhempa re rû bi rû maye; rewşek ku dikare qonaxek nû di dîroka têkoşîna neteweyî ya Kurd de bide destpêkirin, bi şertê ku amûr û saziyên pêwîst ji bo sûdwergirtina ji vê qadê werin peyda kirin. Niha erdnîgariya siyasî ya rojhilatê Kurdistanê (Îran) li ber pêşkeftinek nû ye. Niha kêliyek dîrokî ye ku partiyên Kurdî bi danîna cudahiyên mezhebî, îdeolojîk û taktîkî ber bi yekîtiya neteweyî ve biçin.

Parçebûna siyasî û nebûna hevgirtina stratejîk di navbera partiyên Kurdî de di salên borî de astengiya herî girîng bû ji bo ku pirsgirêka Kurd bibe pirsgirêkek neteweyî û navneteweyî. Ezmûnên dîrokî yên tal nîşan didin ku derfet bêyî hevgirtin û yekîtî vediguherin gefan. Bê guman, divê partiyên siyasî yên Kurd bi çavekî rexnegir li rabirdûyê binêrin û ber bi sêwirandina avahiyek hevgirtî û beşdar ve biçin.

**Prensîbên Bingehîn ên Yekîtiya Partî û rêkxistinên Kurdistanî**

Yekîtiya di navbera partiyên siyasî yên Rojhelata Kurdistanê de divê ne li ser taktîkên demkurt an bertekek li hember krîzekê be, lê divê li ser bingeha prensîbên stratejîk û bi perspektîfek demdirêj were avakirin. Hin ji van prensîban ev in:

**1.** Qebûlkirina pirrengiya rewşenbîrî û rêxistinî: Yekîtî ne hewce ye ku were wateya yekîtiyê. Tevî cudahîyên îdeolojîk, mimkun e ku wekî eniyek hevpar ji bo armancên neteweyî tevbigerin.

**2.** Çêkirina Destûrek Neteweyî ji bo Rojhilatê Kurdistanê: Ev destûr dikare prensîbên wekî mafê çarenûsî, demokrasî, sekularîzm, nenavendîbûn û mafên wekhev ji bo hemî neteweyan di nav xwe de bigire.

**3.** Avakirina Konseya Bilind a Kordînasyona Neteweyî ya Kurdistanê: Ev sazî, bi hebûna hemî partî û kesayetên serbixwe, dikare ji bo biryardanê, dîplomasiya navneteweyî û rêxistina navxweyî referansek be.

**4.** Têkiliya stratejîk bi dîasporaya Kurd re: Civaka Kurd a li derveyî welêt di warên medyayê, lobiyê û piştgiriya darayî de roleke sereke dilîze û divê wekî baskê derveyî yê têkoşîna neteweyî were organîzekirin.

**5.** Amadekariya senaryoyên veguhêz li Îranê: Divê hêzên Kurdî ji bo pêşeroja Îranê piştî Komara Îslamî plan û nexşeya xwe hebe û divê bi dengekî yekgirtî di danûstandinan de bi hêzên demokratîk ên Îranê re amade bin.

Îro Komara Îslamî ya Îranê êdî ne ew aktorê bi bandor ê duh e. Şikestina di şer de, êrîşên îstîxbaratê, windakirina hevalbendên herêmî û bêîstîqrariya navxweyî ew veguherandiye hebûnek parastinê û bêhêvî.

Vê rewşê valahiyek jeopolîtîk afirandiye ku ji bo hêzên neteweyên bindest û demokratîk ên Îranê, nemaze neteweya Kurd, derfetek zêrîn peyda kiriye.

Yekbûna partiyên Kurdî di rewşên weha de êdî ne hilbijartinek e, lê pêdiviyek dîrokî ye. Derfeta ku îro li pêşiya Kurdan e, heke bi gihîştina siyasî, aqilmendiya stratejîk û çalakiyek hevgirtî neyê pêşwazîkirin, dibe ku bi dehsalan dubare nebe. Niha dem hatiye ku gelê Kurd bi îradeyek kolektîf derkeve holê, ne li ser sînoran, lê di çarçoveya pêşkeftinên herêmî de, da ku pêşerojek azad, dadperwer û demokratîk ava bike.

# Siyasetên şaş yên dewletên Norwêjê, piştgirê rejîma Îranê bûye



N. Elî Munezemî



Di Nîsana 1997an de, dadgeheke Almanî gihîşte wê encamê ku rejîma Îranê li pişt kuştinên siyasî ya rêberên kurd li Berlînê ye.

Li ser wê encamê delîl û belgeyên bê şik û guman hebûn: Îstîxbarata Îranê li ser axa Ewropayê kuştin pêk anîbûn. Berteka hember wê kiryara hovane dîrokî bû. Welatên Ewropî balyozên xwe ji Tehranê vekişandin. Norwêjê jî bi salan pêştir balyozê xwe ji Îranê vekişandibû.

Jiber ku Îranê piştî fetwaya dijî Selman Ruşdî, hêrişa terrorîstî kire ser William Nygaard, mudîrê berê yê Aschehoug ku berpirsyarê weşana pirtûka Selman Ruşdî a "Ayetên şeytanî" bû û ew bi tundî birîndar kiribû.

Lê tenê çend meh şûnda ku hemû welatên endam li Yeketiya Ewropayê balyozên xwe li Îranê bi sedema hukmê dadgeha Mîkonosê vekişandibûn, hikûmeta Nurwêjê, di bin serokwezîrîya Bondevik de, destpêşxeriyek dîplomatîk da ku balyozê paşde bişîne.

Delîla wan ew bû ku bi texmîna wan, hilbijartina Serokkomarê "nerm" Xatemî hêviya reformê temsîl dikir. Di pratîkê de,Norwêjê alîkariya normalîzekirina têkiliyan kir - ne ji ber ku Îran guherîbû, lê ji ber ku Ewropa dixwest bawer bike ku ev dikare bibe.

Ev bûyer ne bûyerek tenê ye. Norwêj, û bi taybetî hikûmetên Partiya Karker, ji 40 salan zêdetir rola hevkarê diyalogê û avakerê pira dîplomatîk ber bi Îranê ve lîstine - bêyî ku ewê yekê berçaw bigrin ka rejîm çawa tevgeriyaye.

Encama wê yekê ne demokratîzekirina Îranê pey xwe ve anî, lê dirkirina bêhtir ya rejîmê û darvekirin û kuştina zêdetir a xelkê di hundir û derveyî Îranê bû.

Ev xet di siyaseta derve ya Norwêjê de tê nasîn: "Divê em bi her kesî re biaxivin." Di nav de bi rejîmên dîktatorî re jî.

Ew li ser wê baweriyê ye ku diyalog bi xwe tiştekî baş e, û Norwêj - wekî neteweyek piçûk û aştîxwaz bêyî dîrokeke kolonyal - roleke bêhempa wekî aktorekî bêalî heye.

Lê pirsa ku em kêm caran dipirsin ev e: Kengî "diyalog" dibe stratejiyeke kor ku ji bindestan bêtir alîkariya zordaran dike?

**Îran ne tenê rejîmeke otorîter e, Ew rejîmeke teokratîk e ku zexta birêkxistinkirî ya li ser jinan, darvekirinên girseyî, sansur, tundûtûjiya li dijî neteweyên bêserdest û terorîzma dewletê ya li dijî muxalifên li sirgûnê dike. Lê rêberên Norwêjî bi dehsalan e nîşan didin ku Tehran dê her gav li ser maseyê cihek hebe - çi dibe bila bibe.**

Jonas Gahr Støre vê dawiyê xwesteka xwe ya ku Norwêj dikare di navbera Îran û Dewletên Yekbûyî yên Amerîka de navbeynkariyê bike, anî ziman. Di teorîyê de, ew maqûl xuya dike. Lê di pratîkê de, ew safîtî xuya dike.
Dema ku pêşniyarên weha bêyî daxwazên zelal ji bo reform, şefafî û rêzgirtina mafên mirovan tên, ew wekî qadeke siyasî ji bo rejîmê xuya dikin ku bikar bîne bo berdewamiya xwe.

Her cara ku Tehran di tengasiyê de ye - piştî kuştinên li Ewropayê, eşkerekirina bernameyên çekên navokî, an jî tepeserkirina bi xwînê ya serhildanên gelêrî - welatên rojavayî meyla xwe nîşandane ku deriyên dîplomatîk ên nû vekin li şûna ku wan bigirin. Û bo wî karî Nurwêj pir caran di rêza yekem de bûye.

Îranek heye ku ji bo azadî, wekhevî û demokrasiyê xwepêşandanan dike. Îranek ku ji jin, Kurd û neteweyên din, rewşenbîr û ciwanan pêk tê. Vê Îranê bi berdewamî sîgnyalên bi hêvî ji cîhanê re şandiye da ku rejîma olî rewa neke.

Lê dîplomasiya Nurwêjî hema hema her gav hilbijartiye ku bi nûnerên fermî yên rejîmê re hevdîtinan bike - ne bi dijberên wan re.

Ev pirsek exlaqî û siyasî derdixe holê: Ger beşdariya me ya herî girîng pêşkêşkirina diyalogê bi kesên li ser desthilatdariyê re be - bêyî ku piştgiriyê bide bindestan - em çi şêwazeke aştiyê pêş dixin?

Ma tenê nebûna şerê çekdarî (aştiya neyînî) girîng e an jî stratejiyek ji bo aştiya erênî jî heye? Ma meriv dikare bi rastî jê re aştiya neyînî bibêje dema ku şer tune be, lê rejîm berdewame ku mirovan darve bike?

Norwêj hewce dike ku bi xeta siyaseta xwe ya derve ya li hember Îranê re biguhere.

Ne tenê ji ber ku rejîma li Tehranê ji bo welatiyên xwe gef e, lê ji ber ku ew tevahiya Rojhilata Navîn bêtir bêîstîqrar dike, bi Rûsya û Çînê re hevkariyê dike, û îro ji ewlehiya Ewropayê re gefê dike.

Partiya Karker, ku ji sala 1979an vir ve piraniya demê desthilatdariya hikûmetê girtiye, berpirsiyariyek taybetî heye. Nirxandinek li ser dîrokê qalibek zelal nîşan dide: Dema ku Îran rastî zexta navneteweyî tê, Norwêjê gelek caran xetek a jîyandina dîplomatîk pêrew kiriye - û bi vî rengî beşdarî kiriye ku rejîma olî bikaribe ji bahoza xilas bibe.

Ev ne avakirina aştiyê ye. Ew piştgiriyek siyasî ya pasîf e ji bo aramiya rejîmeke otorîter.

Dema hilbijartina aliyan e - ne di navbera Îran û Rojava de, lê di navbera rejîmê û gelên cihêreng yên bindest li Îranê de.

# Pêwendîyên cîwanan û sîyaseta netewî, mirov çewa dikare bi hev girê bide?



**N. Cano Amedî**



Di heman deman de cîwan pêşeroja neteweyekê ne û beşdarbûna wan di sîyaseta netewî de gelek girîng e.

Ji bo cîwan di sîyaseta netewî de cîh bigirin, erkên xwe bi cîh bînin, divê em demsalên sîyasetê, konjonktura dunyê û rastîya civatê li ber çav bigrin.

Ji ber vê yekê jî divê em zanibin ku carna xwendin, diyalog, nîrxandin û pêşbînîya di nav nifşan de, dikare bibe sedemên tênegiştinê û ji hev dûrketinê. Di vir de girîngîya zimanê çêker, dîyaloga rasteqîn, hevdû fahm kirin û çanda empatîyê gelekî girîng û pêwîst e.

Em baş dizanin ku jiyan bi xwe dibîstaneke bingehîn e, perwerdeya kamilbûnê ya sîyasî, civakî û aborî ji vir destpêdike.

Di hemû rêxistin û şêweyên organîzasyonan de, perwerdeya siyasî û rêxistinî pêwîst e! Em zanin ku li welatên pêşketî, civat di dibistanan de mafê xwe yên demokratîk fêr dibe û tevdigere.

Îro pêwîstî bi dezgehên perwerdeyê heye ku rêxistinên cîwanan karibin xwe organize bikin.

Lê mixabin sîstema dagirkerîyê hemû şêweyên rêxistinbûnê ji xwe re weke xeterîyeke mezin dibîne, rê nade derfetên perwerdeya sîyasî bên afirandin da ku cîwan di derbarê sîstemên sîyasî, îdeolojîyan û ji rola xwe ya di civakê de agahdar bibin.

Em dizanin ku sîstema desthilatdar û civatên di bin dêrûnîya bindestîyê de ne gelek astengî û qedexeyên mezin derdixin holê.

Bendav û dîwarên mezin di navbera nifşan de ava dikin.

Desthilatdar, ji nakokîyên navbera nifşan sûd digirin û pirî caran hestên tirs û hizra bêbawerîyek kûr ava dikin.

Divê ciwanên welatparêz tu carî rê nedin ku di navbera nifşan de nakokî û bêbawerî pêkbê.

Divê rekabet û têkoşîna nav nifşan, li gorî pîvana pêşbirka maratonê ya dest guhertina alayê be, ku ji destekî derbasî destekî din bibe.

**Divê alaya tecrube û têkoşînê di nav nifşan de dest biguhere ku bigihîje armanc û menzîla xwe. Ji bo beşdarbûna di rêxistinên cîwanan de pêwîstî bi zanyarî û enerjîyeke nû heye. Di heman deman de cîwan dinamoya guhertinên civakî ne. Pêwîst e em, her tim piştgirîyê bidin rêxistinên cîwanan ku li ser mijarên sîyasî û civakî bixebitin û dengê xwe bigihînin raya giştî.**

Em dizanin ku sîstemên desthilatdar, ji bo cîwan di nav civatê nebin xwedî bîryar û bandor, mafê dengdanê bi sînor dikin.

Temenê dengdanê naxwazin nizim bikin Bi gelemperî naxwazin ku cîwan zûtir beşdarî pêvajoyên hilbijartinê bibin.

Dixwazin hêzên dinamik kedî bikin û piştre tevlî sîstemê bikin.

Pirî caran sîstema desthilatdar dixwaze enerjî û dînamîzma cîwanan sabote bike û rê li ber wan asê dike. Sîstem bi rêya helwesta tirs û terörê, dixwaze aşê zilmê bixebitîne.

Afirandina derfetan ji bo ku ciwan bibin endamên partîyên sîyasî, xwe ji bo hilbijartinan namzet nîşan bidin û di saziyên dewletê de cih bigirin sînorkirî ne.

Divê bingehek hûqûqî û sîyasî bê amade kirin ku cîwan bibin xwedî maf û derfetan ku bikaribin bê tirs û bê şik beşdarî nav qada sîyasetê bibin.

Ew jî bi têkoşîneke domdar mumkun e!

Sîyasetmedar û rayedar divê goh bidin daxwaz û nêrînên ciwanan û hewl bidin ku wan di sîyasetên netewî de bi cih bikin.

Ji bo wê jî divê em bi sebir li hevdû gohdar bikin û li ser encamên rasteqîn sîyaseta xwe dîzayn bikin. Divê em bi hêsanî li hev gohdar bikin û rêz li nêrînên hevdû bigrin.

Divê em yekser daxwazên xwe li ser hev ferz nekin.

Dîsa bi şêweyekî çêker yê pirsyarî, bi rexnegirî em karibin bi hevre rê û rêbazên serkeftinê tespît bikin û bispêrin siberojê.

Di pêşveçûna ciwanan de rola medya Ji bo siberojêke azad, rola medya û teknolojîyê gellekî girîng û tayînkir e.

Bikaranîna medya û teknolojîyê ji bo gihandina ciwanan û teşwîqkirina wan ku di sîyasetê de çalak bin, bi qasî av û nan pêwîst e.

Pirî caran di warê aborî û teknolojî de hevokek balkêş heye, bi kar tînin.

Dibêjin carna "avantajên derengmayînê dibe destpêka avantajên nû" îro bi rîya têknolojî û derfetên ragihandinê, gelek astengî û dîwarên qedexe hildiweşin.

Gava em giranîya xwe bidin teknolojî û bi zanyarî tevbigerin, bawer bikin emê bi ser bikevin.

Lewra ciwan dikarin bi hêsanî hêza têknolojîyê bi kar bînin û jê sûd bigirin.

Dîroka sîyaseta netewî li Kurdistanê, dîroka têkoşîn, berxwedan û hêvîyê ye.

Kurdan, tevî parçebûna erdnîgarî û zehmetîyên mezin, her dem hewl dane ku nasnameya xwe biparêzin û bigihêjin statûyeke siyasî ya diyarkirî.

Her çiqas li hemû beşên Kurdistanê rewş cuda be jî, xwesteka yekîtîya neteweyî û bidestxistina mafên rewa yên milletê Kurd hîn jî xurt e û di rojevê de ye!

Di qonaxa niha de, xurtkirina hişmendîya yekîtîya navxweyî ya kurdî, diyalog û tifaqên navxweyî, ji bo pêşvebirina doza kurdî mijarên sereke ne.

Motor û dinamîzma serketin û pêşketina sîyaseta neteweyî, bi tecrubeyên têkoşînek domdar, bi ked û xebatên ciwanan pêşve diçe.

Em zanın ku di şertên îroyîn de, bi metod û rêbazên modern, bi alîkarîya teknolojî û ragihandinê, bi alîkarîya dîasporayek bi hêz, şansê sîyaseteke sivîl û demokratîk li Kurdistanê heye, lê ew bi gelek mercan ve girêdayî ye û pêvajoyeke dirêj û bi zehmet divê.

Bi taybetî li Bakûrê Kurdistanê, ji ber nakokîya berdewam û siyaseta dewleta Tirkiyeyê, rewş pir aloz e.

Ji bo diyaloga navxweyî, ji bo çareserîya pirsgirêkan, ji bo pêşxistin û bidestxistina mafên demokratîk û bihêzkirina civaka sivîl, îro pêdivî bi hewldanên bênavber heye.

Divê hemû alîyên sîyasî berpirsiyarîya xwe bi cih bînin ku pêşxistina sîyaseteke sivîl û demokratîk li herêmê desthilatdar bibe.

## Nerîna




**"Donald Trump":**

**"Îranê qebûl nekiriye ku bernameya wê ya navikî were çavdêrîkirin an jî dev ji dewlemenkirina uranyumê berde"**



**" Ayşegul Dogan":**

**"Di çarçoveya pêvajoya çareseriyê de ew li ber qonaxeke nû û girîng in û got, "Em dê di nava hefteya bê de bibin şahidê gaveke dîrokî"**



**"Recep Tayyip Erdogan ":**

**"Di çarçoveya "pêvajoya çareseriyê" de gavên girîng tên avêtin"**



**"Muqteda Sedir" :**

**" Em tevlî hilbijartinên Encûmena Nûnerên Iraqê yên bên nabin heta ku milîşya neyên hilweşandin"**

# Danîna dujminekî navxwe ji bo domandina desthilatdariyê



**N. Eskender Ceiferî**



Li pişt tometa nû ya rêjîma nijadperest ji bo êrîşa ser koçberên Efxan bi tometa sîxurî ji bo Îsraîlê, heman mêkanîzma kevn heye ku hertim domandina desthilatdariya dîktator û dagirkaran, bi danîna "dujminê navxweyî" pêk tê. Çavkaniyên navnetewî yên wekî El-Cezîre û Human Rights Watch hişyarî dane ku rêjîma Îranê, her dema ku aloziyên herêmî zêde dibin, gefên ewlehiyê li civaka Efxan ya bi mîlyonan dike. Lê tiştê ku ev makîneya propagandayê vedişêre ev e ku piraniya van koçberan ji xirbeyên şer, Talîban, pirsgirêkên malbatê û nebûna azadiyê reviyane û karên herî giran û erzan dikin lê dîsa jî li welatekî dijîn ku ji Efxanistanê xirabtir e.

Siyaseta "çêkirina dijminên navxwe" li dijî Efxann ne nû ye; lê etîkêtkirina wan wekî sîxurên Îsraîlê taktîkek xapînok e ji bo tepeserkirinê ku divê her krîzek nû bi hilberandina qurbaniyek nû ji bîra xelkê bibe. Ev tometên bê bingeh dibin biryar ji bo girtin, dersînorkirin û bêrêzîkirina sîstêmatîk; heman guhertoya dubarekirî ku çavên zordar ji gendeliya desthilatê, krîza aborî û bêbandoriya tazî rizgar dike û wê ber bi penaberên bêdeng û belengaz ve diguhezîne.

Di mijara tundûtûjiya regezperestane de, ramanwerê radîkal ê dijî kolonyalîst bi navê Frants Fanon digot ku her dagirkarek ji bo ku bijî, pêdivî ye ku dujminekî din biafirîne; yekî din ku divê rûyekî wek ajelan û metirsîdar hebe da ku zext û tundûtûjiyê rewa bike. Ji bo Fanon, ev "yê din" ne tenê bêdeng dimîne lê di heman demê de wek hov û nemirov tê dîtin. Koçberê Efxan li Îranê bi salan e ku di vê rewşê de ye: keda erzan, bêmaf û bêdengî; û niha "ajanê Mûsadê". Ev heman dagirkariya nû ye ku di nav sînorên netewî de, bêyî sînorên fermî jî, tê hilberandin.

Slavoj Jîjek, fîlozofekî hevçerx e ku dibêje êlîtên serdest hewce ne ku dijminekî navxweyî biafirînin da ku hêrsa girseyan kontrol bikin. Hêrsek ku divê ne li ser koşkên desthilatdariyê, lê li ser malên xêzanên Efxan birêve biçe; heman karkerê ku sibê divê kerpîç li ser kerpîç deyne da ku bajar mezin bibe, lê di heman demê de bi hejandina histûnên ewlehiya netewî jî tê tometbarkirin. Di vê mentiqa şaş de, malbatên Efxan her gav ji ber krîzên ku di afirandina wan de rolek nebûye têne tawanbarkirin û sûcdarkirin.

Antonio Gramsci, serkêşê berxwedana çandî, rave dike ku ev mêkanîzm tenê bi zorê nayê domandin; berevajî vê, rêjîm makîneya xwe ya mêdyayê û amûra propagandayê bikar tîne da ku vê vegotina "gefa Efxanan" di hişê civaka Fars de biçîne. Dema ku ev hêjmoniya çandî pêk tê, gelek Fars, cîranên xwe yên Efxan wekî sîxur dibînin. Ev valahî ji bo domandina pergala heyî derfetek baş e; Parçekirina gel bo "kesên hundirîn" û "kesên derve" da ku dagirkar li ser desthilatê bimîne.

**Di vê navberê de, dengê Dr. Ebdulrehman Qasimlo hîn jî zindî ye; rêberê Kurd ku berî têrora xwe li Viyanayê hişyarî da ku avahiya desthilatdariyê li Îranê bêyî hilberandina dijminekî navxweyî nikare bijî. Wî got ku tepeserkirina kêmneteweyan ne tenê pirsgirêkek êtnîkî ye; ew di heman demê de laboratuwarek e ku rêjîm tê de "tepeserkirina siyasî" pratîk û giştî dike.**

Îro dora Efxanan e, sibê dora her kesekî ye ye ku gumanê li vegotina fermî ya rêjîmê dike. Weke ku çawan ev dehan sal in ku dora tepisandina Kurdan bû.

Tawanbarkirina Efxanan ji bo sîxuriya Îsraîlê, ji gefeke rastîn bêtir e, ew qebûlkirina têkçûna rêziknameya heyî ye ji bo çareserkirina krîzên siyasî, civakî û aborî. Mezaxtina vê siyasetê heman mirovên bê pêlav in ku bêdeng dixebitin, rastî bêrêziyê tên û di dawiyê de tên dersînorkirin.

Li gor ramana Fanon, Jîjek, Gramsci û Dr. Qasimlû, çîrok eşkere ye: "perçe bike û hukmê bike", taktîka kevn û bêrehm e ku civakê heya navikê perçe dike.


Aimé Césaire bi jîrî kokên vê çerxê eşkere dike: kolonyalîst, tundûtûjiya ku li derve tê serê wî, di ser hejaran re dupat dike. Heman siyaseta ku "yê din" di koloniyan de vediguherîne û weke hov, paşverû û metirsîdar binav dike. Herwisa li dijî kêmneteweyan û bindestan tê bikaranîn.

Îro, koçberê Efxanî li Îranê qurbaniyên heman mantiqê ne: divê tiştek were şermezarkirin da ku pergalek di krîzê de bikeve dewsa "ewlehiyê".

Césaire got, "Şaristaniya kolonyal heman hovîtiya ku li welatên dûr li hemberî wê pêk hatiye, vedigerîne dilê xwe." Ev heman hişyarî ye ku, eger bê piştguhxistin, zû yan dereng dê bibe sedema derbasbûna tundûtûjiyê ji sînoran; ji ber ku gava ku kerb saz bibe, tu dîwarek nikare wê rawestîne.

Ev çerx, ewlehî û hevgirtinê nayne; ew tenê hêrs, kerb û bêbaweriyê diçîne ku rojekê dê ji kontrolê derkevin. Qurbaniyên wê, niha Efxanên bêmal in. Weke ku çawan ev dehan sal in ku Kurd jî qurbanî ne. Gelên din qurbaniyên sibê ne. Di vê lîstikê de, tiştek her gav dimîne: hêz jiyaneke derewîn ji bo dagirkar dikire, lê bi bihayê mirovahiyê.

# Sûriye di navbera Îbrahîmî û Osmanîzmê de



N. Ebdulezîz Qasim



Di dîroka navçeyê de, hîç erdnîgariyek bi navê Tirkiyê nîne, û deweta Tirkiya li ser sextkariya dîrokê û talankirin, qirkirina Kurd, Ermen û Yonaniyan û herwiha li ser dagîrkirina beşeke mezin ji xaka kurdistan, Yonanîstan, Qubirstan û Ermenistanê hatiye avakirin.

Pirojeyên Tirkan her ji destpêka xwe ve û heta niha li ser qirkirina gelê resen yên navçeyê têne pêkanîn û bi taybetî li ser qirkirina Gelê Kurd hatine avakirin, heta bigehê pirojeyê wê yê niha jî yê bi navê (Nû-Osmanizmê), yê ku ji aliyê AKP ve tê meşandin tê bi heman armanca duberakirina hejmûngeriya Tirkiyê li ser deverên zêdetir û hewldanên guhertina nexşeya cîpoletîkî ya xwe di çarçoveyê armancên wê yên bingehîn û stratîjî de jibo bihêzkirina hejmûna xwe û zêdekirina destkeftên xwe yên abûrî, leşkerî û siyasî bi sûdgirtin ji rewşa niha ya sist û lawaz li deverê peydabûyî piştî helweşîna çend dewletên Erebî û serhildanên van pazde salan borî yên bi navê (Bihara Erebî) û zêdebûna tevger û desthilata bizav û partiyên Islamî bi taybetî bizava (Exwan Elmislimîn) li ser desthilata çend dewletên Erebî wekî hikumeta Mirsî li Misrê, hikumeta Dubeyba li Lêbiyayê û hikumeta Elşerih li Sûriyê.

**Niha li Sûriyê wisa xuya dibe ku hikumeta Elşerih heta radeyekî di çarçoveyê pirojeyê (Nû-Osmanizmê) de dixebitê, tevî ku projeyê zêdexwaziya Tirkiyê heta radeyekî li ser deverên Rojavayê Kurdistanê û bakurê Sûriyê têne cêbicêkirin**

lê ji aliyê raya giştî ya Gelê Kurd li Sûriyê ve û ji aliyê hindek pêkhatiyên olî ve wekî Elewî, Dirzî û Kirstiyan pilanên Tirkiyê nayê qebûlkirin, nameze ku Tirkiyê pilanên xwe li ser paşguhxistina mafên xelkê Sûriyê û bi taybetî li ser paşguhxistina mafên neteweyî yên Gelê Kurd li Sûriyê ava dike û bi hîç awayekî daxwaz û mafên gelên Sûriyê berçav nagire, û ji aliyekî dîtir ve ku bi hîç awayekî xizemta jinûavakirin û pêkvejiyan û seqamgêriyê li Sûriyê nake, bi taybetî ku di heta vê demê jî li ser destê Tirkiyê û çeteyên wê li Efrînê û Serêkaniyê komkujî û tawanên mezin têne pêkanîn, lê ya herî zêdetir ku Nû-Osmanizm ku rastî pirojeyekî bihêz tê bi navê (Îbrahîmiyê) ku ji aliyê Israelê û deweta Îmarat ya Erebî ve tê meşandin, herwiha ku zêdexwaziya Tirkiyê rastî astengiyên mezin tê ji hêla çend dewletên Europe ve jî bi taybetî Frnsa ku bi giranî pêdagiriyê li ser mafên neteweyî yên Gelê Kurd dike.


Wekî tê zanîn ku pêvajoya aştiyê di navbera hindek dewletên Erebî û Israelê de û bi taybetî digel Erebistana Siûdiyê gihiştibû astekî bilind li pêş heftê Cotmeha 2023ê (7ê October), û niha piştî lawazkirina pêgeha Îranê, dibe ku careke dîtir pêvajoya aştiyê di navbera Ereb û Israelê de destpê bikey, nemaze ku îro mijara aştiyê di navbera hikumeta demkî ya Sûriyê û Israelê de, bûye mijareke gerim û ketiye rojevê, û li gorî raportên çapemeniya Israelê, tê çaverêkirin ku Sûriya di demekî nêzîk de tevlî (Peymana Îbrahîmî) bibe û peymana aştiyê ligel Israelê wajo bikey, û li gorî heman çavkaniyan ku ev yek dê berî bidawîhatina sala 2025an bihête îmzekirin, û wek pêşniyar ku dê li Newyorkê û di heyamê civînên Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî de, Serokê demkî yê Sûriyê Ehmed Elşerih bi Serokwezîrê Îsraelê Benjamin Netanyahu re bicive.

**Bi nebûna ti asoyek zelal ji bo Sûriyê û paşeroja wê, dibe ku Peymana Îbrahîmî wê biparêzê ji dagirkarî û zêdegaviyên Tirkiyê, nemaze ku peymana bi Îsraîlê nabe gef li ser gelê Kurd û mafên wê yên neteweyî, lê tevî vê yekê ji aliyê hindek şirovekarên siyasî ve çend senaryo û bijaredayên dîtir tên pêşkêşkirin ku bêguman heger ew sinyaro bêne pêkanîn dê Gelê Kurd tûşî ziyanek mezin bibe**

, yek ji wan seyanroyên herî metirsîdar, ew jî heger Israel bi daxwaz û mercên hikumeta Elşerih razî bibe ku ev aştiya ligel Şamê li ser hesabê Kurd, Dirzî û Elewiyan bihête îmzekirin, ku li gorî kanala 12 ya Israelê û herwiha li gorî Sky News Erebî jî, li ser devê rayaderekî hikumeta Sûriyê ku "Şam dê daxwaz ji Îsraelê bikey ku yekîtiya Sûriyê bipejirîne û destwerdanê di karûbarên Durzî, Elewî û Kurdan de neke".

Metirsiyek dîtir ew jî heger hat û rêkeftinek sêqolî di navbera hikumeta Elşerih, Tirkiyê û Israelê de bibe, nemaze ku Turmp li ser senyaroyek wiha dixebite, ku qada Sûriyê dabeş bikey di navbera Tirkiye û Îsraelê de, wekî li serdema rejîma Esed di navbera Rûs û Amerîkiyan de bû, nameze danûstandin li Azerbaycanê ji bo kêmkirina nakokiyan di navbera Israel û Tirkiyê de hatin lidarxistin, zêdebarî ku Trump di hevdîtina xwe ya bi Netanyahu re di 7ê Nîsana borî de ragihand, ku ew dikarê her nakokiyek bi Erdogan re li ser Sûriyê çareser bikey, xuya ye ku rêveberiya Trump piştgiriyê dide senaryoyek wisa û amadeye ku di navbera Israel û Tirkiyê de navbeynkariyê bikey da ku pêkanîna wê senyaroyek wiha misoger bikey.

Lê li dawiyê gelo Isreal dê li ser van herdû senyaroyan razî bibe yan razî nabê?.



# Tola Îsikê li difna Mûsikê vedike



N. Hesen Mukerem



Di van hefteyên dawî de, rejîma Îranê dest bi girtinên berfireh kiriye, bi hincet û tohmeta sîxorî bo Îsraîlê.

Li gor raporên fermî û çavdêrên mafên mirov, zêdetir ji 700 kes bi tohmeta hevkarî an sîxorî bo Îsraîl hatine girtin, lê hin çavkaniyên serbixwe vê hejmarê heta 900 kesî jî diyar dikin.

Ev girtinên bê sînor piştî êrîşa Îsraîl li ser Îran û piştî şikestên leşkerî û siyasiya rejîma Îranê di şerê 12 roje de bi Îsraîl rû dane.

Tohmetên li dijî girtiyan gelek fireh in û di nav de "hevkarî bi Mossad", "sîxorî", "têkdana ewlehiya giştî", "belavkirina wêneyên bombebaranan", "xwestina dawî bûna şer", û heta "gef kirina ji berpirsên leşkerî û siyasî" di torên civakî de hene.

Beşek mezin ji girtiyan, welatiyên sivîl, çalakvanên civakî, Behayî, penaberên Efixanistanê û heta geştyarên biyanî û Cihûyên akincî anku xelkê Îranê ne. Gelek ji van girtiyan tenê bo ku film an wêneya êrîşên Îsraîl di mobîlê xwe de hebûn an jî belavokek li torên civakî de belav kirine, hatine girtin.

Lê ev girtin û êrîşên hovane yên rejîma Îranê di bajarên Kurdistanê de berfirehtir e û têkildarîya xurtir ji herêmên din ên Îranê ye.

Li gor rapora Torên Mafên Mirovan Kurdistanê, ji destpêka şerê 12 rojan ya di navbera Îran û Îsraîlê heta niha, zêdetir ji 250 heta 300 welatiyên kurd di bajar û gundên Kurdistanê de hatine girtin û dehan kesên din jî bo navendên ewlehî yên rêjîmê hatine gazî kirin û lêpirsîn.

Girtinên han di bajarên wek Sine, Kirmaşan, Merîwan, Seqiz, Bokan, Mehabad, Serdeşt, Pîranşar û Urmiye de gelek fireh bûn û rewşekî tevav ewlehî û milîtarîzeyek xurt li van herêman heye.

Tohmetên li dijî girtiyan bi gelemperî "sîxorî bo Îsraîl", "propaganda li dijî rejîmê", "çalakî li dijî ewlehiya neteweyî" û heta xwedan amûrên têkilî wek Starlink in.

Di hin rewşan de, welatiyên hatine girtin heta mafê hebûna parêzer an agahdariya malbatên xwe jî tunebûne û têgihiştinek giran heye li ser givaş, tepeseriyên zorî û afrindana tirs û xofê di nav welatiyan de.

Lê herwiha, di nav girtinên fireh de, rapor hatine belavkirin ku hin welatiyên kurd ji hêla hêzên ewlehiyê ve hatine girtin û sê girtiyên kurd bi tohmeta sîxorî bo Îsraîlê bi veşartî hatine îdamkirin ku yek ji van xelkê başûrê kurdistanê bû û kolber bûn.

Di heman demê de, kontrol û lêgerîna mobaîlan di derve û têketina bajarên Kurdistanê de rewşa tirs û xofê zêde kiriye gotinek berê ku dibêje "tola Îsikê difnê Mûsikê re derdêxe" rêjîma Îranê jî nikarê şerê Îsraîlê bike, givaşê dêxe ser welatiyan û xelkê bi tohmeta sîxurî bo Îsraîl digire û siza dide.

Rêxistinên mafên mirov diyar dikin ku ev girtinên han beşek ji siyaseta toldildanxwaz û armancî ya rejîma Îranê ye bo kontrolkirina nerzayetiyên welatiyan li hember rewşa dijwar a jiyanê ku aniye gorê û hewisa girtina welatiyên kurd li Rojhilatê Kurdistanê piştî şikestên dawî li dijî Îsraîlê ji demên berê zêdetir bûye.

Gelek malbatên girtiyan ji tirsa encamên ewlehiyê, agahdariyê nadin û hîn jî heta li ser rewşa girtiyên xwe tiştekê nizanin.

**Rapor nîşan didin ku ev reşbigîriya xelkê, beşek ji siyaseta hov a Îranê ye bo çêkirina rewşekî tirs û bêdengî piştî şikestên ewlehî û leşkerî ye.**

Çalakvanên mafên mirov diyar dikin ku rejîma Îranê, li cihê bersivdanê bo neşiyanî û şikestên xwe, bi girtiyên kolektîf û şerê dijî civakê, dixwaze narazîtiyên giştî û civakî kontrol bike. Weke serokê Rêxistina Mafên Mirovên Îranê dibêje: "Gefxwarina sereke bo mayîna rejîmê ye, ne sîxoriya bo Îsraîlê".

Di vê çarçoveyê de, bi nav Meclîsa Şorayê Îslamî jî bi qanûnên nû, cezaya hevkarî bi Îsraîl re zêde kir û heta tohmeta sîxorî jî bi cezayê îdamê hesiband.

Di heman demê de, gelek çalakvanên civakî yên navdar gef ji wan hatiye xwarin an bo demkî hatine girtin û malbatên hin girtiyan hîn jî nizanin ku mirovên wan li kuderên e.

Bi kurtasî, dewleta Îranê bi hênceta "şerê dijî sîxoriya bo Îsraîlê", şerê girtiyan û têkoşîna fireh li dijî xelkê bêsûç dest pê kir, da ku şikestên xwe di navçeyê û şerê dawî bi Îsraîlê, re veşêr e.



# Komara Îslamî û Îsraîl: Şerekî bêveger



N. Xelîl Mîlanî




Komara Îslamî ya Îranê û Îsraîl bi salan di şerekî veşartî û bi wekalet de bûn. Lê tiştê ku di Xakelêweya 1403 de qewimî nîşana dawiya vê serdemê û destpêka şerekî rasterast û bêveger bû. Di 25ê Xakelêweyê de, bo cara yekem, Spaha pastaran a terorîstî a Îranê rasterast bi êrîşeke mûşekî axa Îsraîlê kire armanc, êrîşek ku ji bo tolhildana kuştina fermandarên Îranî li Lubnan û Filistînê hat kirin. Ji wê gavê û pê ve, her tişt guherî.

Tenê çend roj şûnda, di 31ê Xakelêweyê de, Îsraîl ket qada hewayî ya Îranê, sîstema parastina esmanî a rejîmê seqet kir û rê li ber êrîşên din vekir. Bo cara yekem, şer derket holê. Piştî salan ji gefên “jinavbirina Îsraîlê li ser nexşeyê”, Komara Îslamî niha xwe di pozîsyona parastinê de dît.

Îsraîl bi ciddî ket meydanê, û armanca wê ji destpêkê ve zelal bû: tunekirina tevahî ya eniya berxwedana Îranê. Vê carê, ev kiryar jî xwedî rewateyeke cîhanî bû, ji ber ku axa wê rasterast hate hedefgirtin, û gefên Xameneyî û fermandarên leşkeriyên rejimê li ser “wêrankirina Îsraîlê” li ser Komara Îslamî hatin tomar kirin.

Di mehên pêş de, şaxên herêmî yên Komara Îslamî yek bi yek hilweşiyan. Ji Hamas û Hizbullah bigire heya Hûsiyan, tu kes nekarî li hember makîneya şer a Îsraîlê û piştgiriya Amerîkayê bisekine. Îsraîl ne tenê li meydana şer, lê di warên dîplomasî û medyayê de jî çalak bû; ji lobiyê li Washingtonê bigire heya wergirtina piştgiriyê ji hevalbendên Rojavayî ji bo hilweşandina binesaziya mûşekî û navokî ya Îranê.
Rastî ev e ku piştî hilweşîna Sedam, Komara Îslamî valahiya ku Iraqê li herêmê hiştibû tijî kir û bi rêya milîsên xwe ve, bi salan hêza xwe nîşan da. Lê heman nîşandana hêzê niha bûbû gefek cîhanî. Kuştina Qasim Silêmanî berî çend salan bû sedema destpêkirina hilweşîna Komara Îslamî li herêmê.

Niha, di Cozerdana 1404an de, me yek ji êrîşên leşkerî yên Îsraîlê yên bêhempa li ser Îranê dît. Êrîşan 12 rojan dom kirin û piraniya binesaziya hesas a mûşek, navokî û leşkerî ya rejîmê wêran kirin. Gelek fermandarên leşkerî û zanyarên navokî di şevekê de hatin kuştin, û Xameneyî, ku heta duh behsa “sekinandina xurt” dikir, niha neçar ma ku di binerdê de agirbestê îlan bike; wî heta newêrîbû derkeve jî.

Di van êrîşan de, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê jî tevlî şer bû û bi bombebarankirina tesîsa Fordowê bi bombebaranên B-2 nîşan da ku Komara Îslamî êdî ne amade ye ku bi projeya bombeya navikî bibe gef bo ser cîhanê.

**Niha, Komara Îslamî hema bêje hemû hêza xwe ya sereke winda kiriye: ti projeyek navikî nemaye, ti rehînegirtin kar nake, û ti hêzên wekaletî nikarin vê rewşê biguherînin. Veberhênana bi salan di pîşesaziyên leşkerî û navokî de di çend şevan de bûye dûman**

Gelo ev dawiya şer e? Ne mimkûn e. Agirbesta heyî ji bo rejîmek ku tiştek ji bo şantajê tune ye, bêtir bêhnvedanek demkî ye. Îsraîlê ragihandiye ku ew êdî tehdîda Atomî ya Komara Îslamî tehemûl nake, Bi taybetî jî dema ku fermandarên Pasdaran ên Îranê bi eşkereyî behsa bikaranîna mûşekên serên navokî ji bo hedefgirtina Îsraîlê dikin.

Niha, ev şer ne tenê Rojhilata Navîn guhertiye, lê di heman demê de ji bo gelên bindest ên Îranê derfeteke zêrîn peyda kiriye. Kurd, Belûcî, Ereb, Tirkmen û Azerî ezmûna tal a şoreşa 1979an hene. Lê îro şert û merc cuda ne; Înternet, medyaya civakî û hişyariya giştî mirovan ji bo hilweşandina rejîmê amade kiriye.

Rola opozisyonê di vê qonaxê de pir girîng e. Bi dilxweşiyê ve, Partiyên Kurdistana Îranê, xwedî ezmûn û avabûneke baş e, û xelk ji her demê bêtir hişyar e. Ger yekîtî û hevgirtin hebe, vê carê em dikarin derfeta dîrokî bikar bînin û azadî û mafê çarenûsî bi dest bixin.
Bi bidawîhatina Peymana Lozanê û danîna Peymana Îbrahîm, Rêya Dawid, normalîzekirina têkiliyên di navbera welatên Ereb û Îsraîlê de, û ji nû ve xweşkirina riya nexşeya Rojhilata Navîn, hemî soza guhertinek mezin didin; guhertinek ku, ger em bi aqilmendî tevbigerin, dikare bibe sedema azadiya gelan û bidawîhatina dîktatoriya Komara Îslamî.

**Dîrokê nîşan daye ku her rejîmek ku gef li Îsraîlê xwariye an jî êrîşî wê kiriye, hatiye hilweşandin: ji Sedam bigire heta Qezafî. Xamineyî dê ji vê çarenûsê xilas nebe.**

Dîrokê nîşan daye ku dîktator naguherin lê dikevin, rejîma dîktatorî ya Xameneyî jî ji vê qaîdeyê ne îstîsna ye, û em ê bibînin ku Komara Îslamî dê berê xwe bide tepeserkirinek tundtir li ser netewe û gelên Îranê, û xwepêşandanên navxweyî dê bibin sedema dawiya rejîmê.



# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Mûsa Omîdî, endamê “Bereya Yekgirtiya Kurd”, ji aliyê rêjîmê ve hate girtin

Hêzên îtilaat rêjîmê li bajarê Îlamê, bi awayê xosearne, êrîş kirine ser mala “Mûsa Omîdî” yê endamê “Bereya Yekgirtiya Kurd” û ew binçav kirin û bo cihek nexuya veguhatin.

Li berdewamiya binçavkirinên xoserane li Rojhilatê Kurdistanê, li roja Çarşemî 11ê Pûşperê, Hêzên hov ên îtilaat rêjîmê li bajarê Îlamê, bi awayekî xosearne û bê belgeya yasayî, êrîş kirine ser mala Mûsa Omîdî, endamê Bereya Yekgirtiya Kurd û ew binçav kirin û hejmarek ji alavên wî yên kesîn ên wek “mobayl, Leptap û pirtûkên wî” digel xwe birin.

Mûsa Omîdî, lêkolerê civakî û mamostayê berê yê zanîngehê ye ku bi sedema dîtingehên wî yên rexnegirane,  ji karê mamostatiya zanîngehê hatiye derxistin.

Navbirî li heyva Xakelêwe ya sala 1401 a Rojî de kevte ber kerb û kîna rêjîmê û bi tohmeta “propaganda bo girûp an rêkxiravên dijberî rêjîmê” bo dadgeha rêjîmê li bajarê Îlamê hate gazîkirin.

Heta belavbûna vê nûçeyê sedema binçavkirin, tohmetên sepand bi ser wî mamostayê zanîngehê û cihê ragirtina wî nehatiye zanîn.



## Hêzên rêjîmê bi awayekî hovane jinek Belûç Kuştin û 11 jinên dinê jî birîndar kirin

Pêka raporên belavbûyî hêzên hov ên rêjîmê, li gundekî ser bi bajarê Xaşê, êrîşkirine ser jinên wî gundî û bi teqeya rasterast jinek kuştin û 11 jî birîndar kirin.

Hêzên hov ên ewlehî û serabaziyên rêjîmê li devera “Karwander” a ser bi bajarê “Xaş”ê bi awayê xosearene û bi çekên şer êrîş kirine ser gundê Gunîçê û bi hêceta lipeyketin bi kesên çekdar, bê agehdarkirina xelkê gund çone nav malên xelkê û rasterast, teqe li jinên wî gundî kirine.

Wan hêzên hov tevî reftara tund digel jinan û lêdan û kutanê, jinek Belûç kuştin û 11 jinên dinêye Belûç jî bi dijwarî birîndar kirine.

Herwisa li encama vê êrîşa hovane ya rêjîmê de jinek pêgiran, bi sedema lêdan û birîndarbûnê zaroka xwe ji dest daye.

Ew êrîşa hovane li halekê de hatiye kirin ku ti kesekî çekdar li wî gundî de nebûye û ew kirayara rêjîmê dide xuya ku Rêjîma Îranê tola şikesta serşoraneya xwe ji Îsraîl û Amerîkayê, ji jin û zarokên bêtavan hil dide.

Wan jinan li bertekê de rêya wî gundî bi agirberdan bi tekeran daxistin.



## Binçavkirinên xoserane a welatiyan ji aliyê rêjîmê ve berdewame

Çendîn welatiyên din jî ji aliyê hêzên îtilaata rêjîmê hatine binçavkirin û qedera welatiyên binçavkirî jî li girtîgehên rêjîmê her bi nerohnî mane.

Pêka raporên belavbûyî, li roja Yekşemî 8ê Pûşperê, hêzên hov ên rêjîma Îranê li bajarê Merîwanê de “Ehsen Osmanî, Hemze Osmanî, Omîd Baxe, Ebdula Baxe û Ramyar Rizayî”, ên xelkê gundê “Derenaxî” ser bi bajarê Merîwanê binçav kirin

Herwisa li 7ê Pûşperê, “Seyîd Kemal Îbrahîmî” yê xelkê bajarê Nexedê û “Yûnis Tenhayî” xelkê bajarê Mihabadê, li 5ê Pûşperê “Areş Melamihemedî”, li bajarê Mihababadê û li 4ê Pûşperê, “Elîriza Xalidî” temen 22 salî xelkê gundê “Hesnawa”yê ser bi devera “Soma” ya bajarê Selmasê û Herwisa “Kêywan Aştab, Areş Melamihemedî û Yûnist Tenhayî”, xelkê bajarê Mihabadê ji aliyê hêzên hov ên îtilaat rêjîmê ve hatine girtin.

Li 1ê pûşperê de jî “Hesen FelaHiyan naskirî bi Hawar Rojhilatî” li bajarê Pîranşarê, Keywan Silêmanî û Bêhrûz Şerîfiyan xelkê bajarê Bokanê û Ebdula Resûlî xelkê bajarê Dîwanderê ji aliyê hzên ewlehî yên rêjîmê ve hatine gitin.

Piştî derbasbûna çendîn roj ji binçavkirina hovane û xoseraneya wan welatiyan, qedera wan bi nerohnî maye.


Herwisa gorî wan zaniyariyên ku digehne dest me, hêzên îtlaatî û ewlehiye rêjîmê li seranserî Rojhilatê Kurdistanê de herwisa berdewamin li ser girtina xelkê û bê belge êrîşê dikne ser malan û tewtêş dikin.



# Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (497)



# Niştiman!

**Şeref e û bi zorê naçe ber mirovên bêşeref de**

**ji bo bîranîna 100mîn salvegera li sêdaredana rêberê doza azadiya gelê Kurd, Şêx Se'îdê Pîran(1865 - 1925)**

**Partiya Demokrat A Kurdistana Îranê**
Navenda Ragihandinê